

Nûçe û Calakî

Goçbarkirina Mihemedê Tûj

Nûçe û Çalakî

Li dûriyê – Almaniya- Piştî berxwedaneke dirêj bi nexweşiyê re, siyasetmedar û nivîskarê Kurd birêz Mihemed Mele Ehmed yê bi navê Mehmedê Tûj dihat nasîn , di 29/09/2009an ji nav me barkir . Û di 04/10/2009 an de, Termê berêz digiha Qamşlo, bi beşdariya xwedî, berketî, tevgera Kurd, di goristana Qudûr Bekê tê binaxkirin.

Li ser gurnê, ev gotinên jêrîn hatin pêşkêşkirin :

1-Gotona sekretêrê p Yekîti, berêz Fuad Elîko . 2- Endamê komîta siyasî ya El-partî, berêz M. Ismaîl . 3- Rêxistina Yekîti ya Demokrat A Kurd li Sûriyê (Yekîti), berêz Ebdilsemed 4- Nivîskar, birêz Ibrahîm Mehmûd û ji aliyê melbatê ve, Gotina hevjinê M. Tûj, birêz Keça Kurd, g Kurê wî Ebdirezaq û helbestek bi dengê keçek ji malbatê bi dawî bû. Hemî gotin li ser xebat û sinciyê xebatkarê me yê hêja bû.

M. Tûj di sala 1935 an de, li Dêrîkê ji dayîk dibe. Xwendina bilind, beşê dîrokê di ala 1968î zanîngeha Şamê kuta dike. Di destpêka temenê xwe de, bi kurdayetiyê mijûl dibe û di sala 1952 an de, bi Samî Mele Ehmed, Ebdilezîz Elî Ebdî û Derwîş Mele Silêman re, **Civata Yekîtiya Xortên Demokrat A Kurd- Cezîrê-** damezrandî.

Piştî damezrandina Partî di 14î Hizêrana 1957 an de, tevlî partî dibin. Di sala 1961 de, tê girtin û demekê di zîndaznê de dimîne, Piştî ji zêndanê derdikeve, dev ji karê siyasî berdide. Lê, li rex mîlet û tevgera xwe dimîne. Di sala 1995 an de, berê xwe dide Almaniya . Li welêt û dûriyê pir berheman dinvîse . berhemên birêz M. tûj ev in: 1- Dîroka Partî qunaxa Yekê 1957 – 1965- 1991- bi zimanê Erebi 2-Xoyêbûn, Civata - Serxwebûna Kurdî. 1927-1964 – sal 1993, bi zimanê Erebi. 3- Pêwendiyên Kurd û Ermenan –sal 1993, bi zimanê Erebi.

4- Bedirxan Mîrê Botan –sal 1999 bi zimanê Erebi- Almaniya. 5 – Pîrsa Kurdî Li Sûriyê. Sal 2001 bi zimanê Erebi, Almaiya. 6- Xebatkarê Kurd ê mezin Osman Sebrî- sal 2003 bi zimanê Kurdî û Erebi di yek bergeyê de- Almaniya . 7-Qasimlo Evîndarê welêt sal 2004 – Almaniya 8- Kurdistan di navbera Dagîkirin û serxwebûnê de- sal 2005 bi zimanê Kurdî û Erebi – Almaniya.

Bi boneya goçbarkirina birêz, bi navê kovara Pîrs û weşana Newroz "Behîname" Jêrîn ji malbata wî re rêbûye.

Behîname

Malbata Mele Ehmed

Xwişka Keça Kurd

Malbata Buhuşti Mihemed

Bi dilekî tev kul û kovan, me nûçeya koçkirina kesayetiyê, welatparêz û xebatkarê payebilind Mihemedê Mele Ehmed, li derveyî welêt bihîst.

Buhuşti Mihemed, di malbateke welatparêz de xwedî û perwerde bûye. Piştî ku wî çavên xwe li jiyane vekirine û bîrewer bûye, zor û sitema li ser gelê xwe dîtiye, ew tevî rêzên Tevgera kurdî bûye, zend û bendên xwe vemaltine, bi dilsozî û hişmendî daketiye qada kar û xebatê. Bi wêrekî, dengê xwe dijî sitemkarî û zordariya ku li ser gelê Kurd dihat bikaranîn bilind kiriye, ciwaniya xwe di vê riya pîroz de wînda kiriye û li zindanên destelata Sûriyê bûye mêvan.

Digel hemî dijiwariyên jiyane, buhuşti Mihemed riya bîr û baweriyên xwe bernedaye, her û her, ta roja dawiyê ji temenê xwe, ew girêdayê doza gelê xwe ya dadmend û rewa maye.

Serê gelê Kurd sax be

Serê malbat û zarokên wî xweş be

Cihê wî buhuşt be!.

Kovara PIRS

Weşana NEWROZ

Sûriyê 01.10.2009z-2621K